

# Destnîşan

# JI BO AŞITÎYÊ

## Li Bajarên Kurdan Akademîsyenên Aşitîyê Yên BHD'yî

YENİ YAŞAM DERNEĞİ
KOMELEYA JIYANA NÛ
2018

Hollanda Kraliyeti

# CONTENTS


01 Destpêk .2

02 Mînakeya Vekolînê .4

03 Belavebûna Sehayî Ya Akademîsyenan .08

04 Pirsên Vekolînê .10

05 Peydên Bingehîn .12

06 Pêzanînên Takekesî .14

07 Pêvajoya Îmzeyê .16

08 Pêvajoya Îmzeyê û Bandorên Wê .20
- 8.1. Bandorên Derûnî
- 8.2. Bandorên Aborî
- 8.3. Bandorên Akademîk
- 8.4. Qewimînên Pêvajoya Îmzeyê
- 8.5. Têkilîya Îmze û Aîdîyetê

09 Pêvajoya Îxracê û Bandorên Wê .32
- 9.1. Bandorên Derûnî
- 9.2. Bandorên Aborî
- 9.3. Bandorên Akademîk

10 Result .40

11 Appendix .42


*Ev vekolîna sehayê li ser navê 'Komeleya Jîyana Nû' di çarçoveya projeya "Akademîya Aborî û Civakê" da, ji alîyê akademîsyenê bi navê Firat Çapan, ku ji kar hatiye avêtin, hatiye amadekirin.*

01

# Destpêk

Însîyatîfa Akademîsyenên Ji Bo Aşitîyê, însîyatîfeke wisa bû ku ji ber xwe va derket, xebatên xwe li ser bingeha mafên mirovan kir û di wê şîyanê da bû ku ji bo armanca civakeke bê tundî danezana li dijî şer aşîtîyê biweşîne. Ev xebat bi armanca çêkirina bîreke hevpar ya li ser neheqîyên li dijî akademîsyenên ku ji bo aşitîyê îmze avêtine û li bajarên Kurdan dijîn, hatiye kirin.

Ev vekolîn ji alîyê Komeleya Jîyana Nû ku li Amedê bicih e, di çarçoveye bernameya Matra'yê ya Sefaretxaneya Hollandayê da hatiye kirin. Vekolîn li ser binpêkirina mafên akademîsyenên ku li bajarên kurdan dijîn û bi BHD'yan (Biryarnameya Di Hukmê Destûrê Da) ji kar hatine avêtin û serpêhatîyên wan yên BHD'yan, bandorên akademîk, derûnî û aborî hatiye amadekirin. Di çarçoveya vekolînê da hevdîtnên wekî dîdarên nîv çêkirî û dîdarên bi kûrahî bi 24 kesan ra hatine çêkirin ku 20 ji vanan akademîsyenên BHD'yî ne, 1 bijîşk, mamosteyek mensûbê WPD/MEB'ê ku ji kar hatiye dûrxistin û du akademîsyenên ku îmze avêtine danezana aşitîyê lê li ser karê xwe ne. Li gorî daneyên ku hatine bidestxistin ev xebat hatiye amadekirin. Akademîsyenên ku bi wan ra hevdîtin hatine kirin ew akademîsyen in ku di çapemenîyê da wekî ***"akademîsyenên aşitîyê"*** têne zanîn û îmze avêtine metna danezana ***"Em ê Nebin Hevparê Vî Sûcî"*** û li zanîngehên herêmên kurdan dixebitin an jî li herêma kurdan dijîn û ji kar hatine avêtin. Ev xebat, di heman demê da analîza ezmûna akademîsyenên îxracbûyî dike ku bûne şahidê şer û pevçûnên ku piştî 2015'an li herêmê dest pê kirine û lê dikole ku gelo tecrubeya wan ya jîyana herêmê piştî vê pêvajoyê çawa guherîye. Di çarçoveya vekolînê da bi 4 akademîsyenên Zanîngeha Mardin Artuklu, 11 akademîsyenên Zanîngeha Dicle, akademîsyenek ji Zanîngeha Marmara, akademîsyenek ji Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, akademîsyenek ji Zanîngeha Adiyamanê, mamosteyek ji kar dûrxistî û bi bijîşkek ku peymana wî hatiye betalkirin ra dîdarên rûbirû yên nîv çêkirî û yên bi kûrahî hatine kirin. Akademîsyenek ji ber ku li bajarek cuda bû hevdîtina pê ra bi rêya telefonê hatiye kirin. Di çarçoveya vekolînê da li ser van xalan hatiye sekinîn: Bûyerên ku di pêvajoya îmzeyê da hatine jîyîn, motîvasyonên bingehîn yên ku rê lê vekirine ku ew îmze bavêjin, pêvajoya ji kar avêtinê û bandorên derûnî, aborî ku dûre li wan qewimîne û bi giştî di çarçoveya azadîya akademyayê da bandora îxracan ya li ser zanîngehên herêmê. Hevdîtin bi piranî li kargeha Komeleya Jîyana Nûh û hinek jî li mekanên cemawerî û hin jê jî li kargehên dîdaran hatine kirin.

# 02

## Mîinakeya Vekolînê

Ev vekolîn xwe dispêre akademîsyenên ku li bajarên kurdan dijîn û ji zanîngehên herêmê bi BHD'yan ji karê xwe hatine avêtin, bijîşkek û mamosteyek ku li herêmê dijîn û bandora BHD'yan li ser wan çêbûye. Ji ber ku em dixwazin bandora RA'yê ya li herêmê bipîvin me beşdarên ku bi piranî kurd in û ji zanîngehên bajarên kurdan hatine îxrackirin ji vekolîna xwe ra kirin navend. Hejmara îxracan yên zanîngehên bajarên kurdan bi vî awayî ne. Di nava vanan da bi 21 kesan ra hevdîtinên rû bi rû hatine kirin.

| | |
|---|---|
| **Zanîngeha Dîcleyê** | 23+1 (Akademîsyenê ku peymana wî/wê nehatiye nûkirin) |
| **Zanîngeha Adiyamanê** | 4 |
| **Zanîngeha Ağrı İbrahim Çeçen** | 1 |
| **Zanîngeha Batmanê** | 3 |
| **Zanîngeha Bingolê** | 1 |
| **Zanîngeha Hakkariyê** | 2 |
| **Zanîngeha Mardin Artuklu** | 11 +1 (Li Zanîngeha Ankarayê ÖYP'yî) |
| **Zanîngeha Munzurê** | 14 |
| **Zanîngeha Muş Alparslan** | 3 |
| **Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl** | 13 |
| **Zanîngeha Şırnakê** | +1 (Li Zanîngeha Marmarayê bi xala 35. Peywirdarkirî) |
| **Yekûn** | 78 |

Metna îmzeyê ku bûye hênceta binpêkirina mafên van beşdaran, ji ber ku bi pêvajoya şerê 2015-2016'an ra têkildar e; ev çarçoveya civakî ya cuda rê li tecrube û bandorên cuda vedike. Nasnavên akademîk yên akademîsyenên îxracbûyî ku tevli vê vekolînê bûne di grafîka jêrîn da hatine nişandan. Li gorî vê yeke 9 profesorên îxracbûyî, 1 doçent, 3 alîkarên doçent (binavkirina wê heyamê), 2 peywirdarê hîndekarîyê, 4 peywirdarê vekolînê, 1 bijîşk û 1 mamoste ketine jêr vekolînê.





Ji nîvî zêdetir yê beşdarên vekolînê ji alîyê karîyera akademîk va dema ku hatine îxrackirin xwedî statuya doçentî an jî statuyek berjortir bûne.

Dema ku belavebûna zayendî bê vekolîn tê dîtin ku ji 21 kesên ku ketine jêr mînakeya vekolînê 4 jê jin û 17 jê mêr in.




Belevebûna akademîsyenên ku di çarçoveya vekolînê da bi wan ra hevdîtin hatine kirin bi vî rengî ye: 4 ji Zanîngeha Mardin Artuklu, 11 ji Zanîngeha Dicleyê, 1 ji Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl, 1 ji Zanîngeha Adıyamanê. Ji %61'yê beşdaran akademsîseyenên ji Zanîngeha Dicleyê ne û di dema ku li ser karê xwe bûne hatine îxrackirin.



03

# Belavebûna Sehayî Ya Akademîsyenan

Dema ku belavebûna sehayî ya akademîsyenên îxracbûyî tê vekolîn tê dîtin ku tablo ji ya bajarên rojavayê Tirkîyê cuda dibe. Li bajarên rojava piranîya akademîsyenên aşitîyê di sehaya Zanistên Civakî da kar dikin lê yên ku li bajarên kurdan e bi piranî di sehaya Zanistên Fenê da kar dikin. Li dû vê yeke 10 ji beşdarên vekolînê di sehaya Zanistên Fenê da, 9 jê di sehaya Zanistên Civakî da, 2 jê jî di sehaya Zanistên Tetbîqî/Sepanî da kar dikin.



04

# Pirsên Vekolînê

Pirsên vekolînê ji bilî pêzanînên takekesî, ji pêvajoya îmzeyê, îxracbûn û bandorên wê yên derûnî, bandorên aborî û bandorên akademîk pêktên. Pirs bi armanca pîvandina bandorên îxracan yên li ser hilberîna akademîk û piştgirîya akademîk, serborîyên akademîsyenên ku li herêmê dijîn û hevbandorîya di navbera jîyîna li herêmê, nasnameyê û zanîngehan da hatine amadekirin. Di heman demê da binpêkirinên mafî yên ku hatine serê akademîsyenan, bandora fîzîkî û derûnî ya îxracan li ser tenduristîyê, bandorên aborî û bandorên li ser malbat û derdora civakî jî daxilî nava vekolînê hatine kirin. Hemî hevdîtin bi destûra dîdaran hatine qeydkirin.

# 05

## *Peydên Bingehîn*

Peydên bingehîn yên ku di vekolînê da hatine bidestxistin bi rengê sernavên esasî hatine kategorîzekirin. Li gorî vê yeke pêvajoya îmzeyê û îxrackirinên ku piştî pêvajoya îmzeyê dest pê kirine wekî pêvajoya îxrackirinan di du kategorîyan da hatine vekolîn. Pêşketinên di pêvajoya îmzeyê da û yên piştî pêvajoya îmzeyê hatine dîtin, hewldana çewisandinên piralî yên ku li ser akademîsyenên aşitîyê hatine sepandin û bandorên van çewisandin û binpêkirina mafan yên li ser akademîsyenan hatine tesnîfkirin. Li dû vê yekê bi kurtî li ser bandora takekesî ya van encaman hatiye sekinîn.

06

# *Pêzanînên Takekesî*

- 3 ji beşdaran ji pêvajoya RA'yê rasterast bandordar bûne û xizmên wan yên dereceya pêşîn yan hatine îxrackirin yan jî demekê ji karê xwe hatine dûrxistin.

- 7 ji beşdaran mecbûr mane ku piştî îxracê cihê xwe biguherînin, 3 jê ji bajarê ku dijîn bar kirine bajarekî din.

- Beşdarên ku li Zanîngeha Dicleyê kar dikin ji ber ku îmze avêtine metna bi navê ***"Em ê nebin hevparê vî sûcî"*** hem doz li wan hatiye vekirin û hem jî di heqê wan da lêpirsîna "endamtîya rêxistinê" hatiye vekirin. Di doza pêşîn da hemû beşdaran berat kiriye û di ya diduyan da jî doz bi bêtaqîbîyê bi encam bûye.

- Ji BHD'yîyên ku qedexeya derketina derveyê welat li wan hatiye sepandin, 7 jê tahdîda li ser pasaporta wan hatiye rakirin û yên din jî serlêdanên wan hîn nehatine bi encamkirin.

# 07

## *Pêvajoya Îmzeyê*

- Metna îmzeyê bi rêya înternetê gihîştiye ber destê hemî beşdaran.

- Hemî beşdaran vegotiye ku wan metna îmzeyê wekî gelek metnên dî yên ku li ser torên înternetê diğerin, li ser malperên înternetê dîtine û texmîn nekirine ku dê ew qasî deng bide.

- Hemî beşdarên ku îmze avêtine metna ***"Em ê nebin hevparê vî sûcî"*** vegotine ku dema ku wan metnê îmze kiriye motîvasyona wan ya bingehîn rawestandina şer û pevçûnan û vegera li pêvajoya aşitîyê bûye û ji ber ku xwestine çi ji destê wan bê bikin, îmze avêtine metnê.

- Piranîya beşdaran vegotiye ku di navbera nasnameya wan û avêtina îmzeyê da têkilîyek tuneye, hinan jê jî vegotiye ku têkilîyeke qismî heye lê ev ne dîyarkereke bingehîn bûye ji bo wan. Wan îfade kiriye ku helwesta wan ya sîyasî ji nasnameyê bêtir girêdayî prensîbên mirovî û gerdûnî pêş ketiye.

- Beşdaran vegotiye ku piranîya akademîsyenên aşitîyê ji zanîngehên rojavayê welat in û bi nasnameya xwe ya etnik tirk in û herweha gelekî ji akademîsyenên kurdan îmze neavêtine metnê û ev yek nîşan dide ku di avêtina îmzeyê da ji refleksên nasnameyî bêtir bandora nirxên gerdûnî yên wekî mafên mirovan û hiqûqê heye. Beşdaran kêmbûna îmzeyan ji zanîngehên bajarên kurdan, hinekî bi çewisandinên li zanîngehên taşrayê û hinek jî bi çanda tirs û xofê va girêdane.

- Piranîya beşdaran vegotiye ku wan naveroka metna îmzeyê normal dîtiye û li hember giranîya bûyerên ku hatine jîyîn zimanê metna îmzeyê munasib e/seza ye. Du ji beşdaran vegotiye ku dibe ku zimanê metna îmzeyê hinek dî jî nerm bûna û beşdarek dî jî vegotiye ku dema ku mirov

ji alîye ewlehîya hemî civakê va binêre divîya ku ji rêxistinê (PKK) ra jî bangewazî bihata kirin lewre divê bihata pêşbînîkirin ku dê zîyanên sivîl çê bibibin û rexneyên ku di vê mijarê da hatine mafdar in.

- Du ji beşdaran li hember pirsa ku, gelo wê îro jî îmze bavêjin heman metnê an na, bersiv nedane lê yên dî hemîyan digel hemî tiştên ku hatine serê wan îfade kirine ku di heman rewşê da wê dîsa îmze bavêjin heman metnê û li pişta menta aşitîyê sekinîne.

- Jîyîna li herêma şer û şahidîya rasterast ya li pêvajoya şer, bandoreke gelekî giran li piranîya beşdaran kiriye û vê yeke bi wan ra hîsa ku ew nikarin şer û mirinan bidin sekinandin çêkiriye û bi bandora vê yeke îmze avêtine metna aşitîyê. Lê li gorî beşdarek şer û bûyerên giran li ser hin kesan bandorek rasterast çêkiriye û bi vê bandorê xwe vekişandine ku îmze bavêjin binê metnek bi vî rengî.

- Hemî kesên ku metnê îmze kirine vegotine ku wan metnê bi însîyatîfa xwe îmze kirine û di binê bandora alîyekê da nemane.

- Beşdaran vegotiye ku piştî daxuyanîyên Serokkomar metna îmzeyê bêtir ketiye rojevê û ji ber van daxuyanîyan û tehdîdên hin derdoran ew ketine nava guman û endîşeyan. Lê wan îfade kiriye ku ji ber ku ew bi halê xof û endîşeya ku li bajarên kurdan dijîn aşina ne, vê rewşê guhretineke mezin di jîyana wan da çênekiriye.

- Di derbarê bandora metna ***"Em ê Nebin Hevparê Vî Sûcî"*** da piranîya beşdaran hemfikir in ku şer nedaye sekinandin û di pêvajoya demkin da yên ku metnê îmze kirine hatine "lenetkirin"/şeytanîkirin û vê yeke mesafeya navbera

civakê kûrtir kiriye. Lê ji alîyek dî va jî bi rêya vê metne bûyerên ku li vê derê dijîn ketine rojeva civak û çapemenîya navnetewî û di pêvajoya dem dirêj da ji alîyê parastina aşitîyê va bandoreke wê ya erênî çêbûye. Ji ber vê yekê beşdar di wê bawerîyê da ne ku herçendî di pêvajoya demkin da bandorên wê yên erênî zêde çênebûbin jî di pêvajoya demdirêj da dê bandorên wê yên erênî çê bibin.

- Beşdaran vegotiye ku di pêvajoya îmzeyê û piştî îmzeyê da ew ji hemî mafên xwe yên welatî yên wekî ***mafê seyahatê, mafê xebatê û mafê xwe îfadekirinê,*** hatine mehrûmkirin.

08

# Pêvajoya Îmzeyê û Bandorên Wê

Di xebata sehayê da hate tesbîtkirin ku akademîsyenên di pêvajoya îmzeyê da îmze avêtine Metna Aşitîyê, tûşî binpêkirina mafan bûne û bandorên van binpêkirinan yên gîyanî, derûnî, civakî, aborî li ser wan bûye sedema zîyanên mayende. Di vê beşa xebatê da em li ser bandorên mayende yên derûnî, akademîk û aborî yên ku di pêvajoya îmzeyê da akademîsyen bi wan ra rû bi rû mane rawestîyane.

## 8-1. Bandorên Derûnî

- Piranîya beşdaran vegotiye ku ew li bendê bûne bên îxrackirin û ji ber vê yeke dema ku bihîstine ew hatine îxrackirin bi vê yekê heyirî nemane lê dîsa jî li ber ketine ku ew bê kar mane.

- Piranîya beşdaran îfade kirine ku endamên malbata wan jî ji vê pêvajoyê bandordar bûne lê bi piranî îfade kirine ku wan di vê pêvajoyê da ji malbatên xwe piştgirî girtine. Ji ber ku beşdar li bajarên kurdan dijîn hem ji derdora malbatî û hem jî ji derdorên hevalên xwe piştgirî dîtine ku ev yek avantajek e û taybet e bi bajarên kurdan. Beşdaran îfade kiriye ku jîyîna li bajarên kurdan ji bo wan bi tu awayek nebûye dezavantajek û heta wan gelek avantajên vê dîtine û ji ber ku îxrac bûne bi ti awayî tûşî çewisandinên civakî nebûne û herwiha hatiye çavdêrîkirin ku ev yek ji bo îxracên ku ji cemaetê pêkhatine jî bi heman rengî ye.

- Beşdaran îfade kiriye ku di vê pêvajoyê da bi tenê hinek nasên wan yên li zanîngehan xwe ji wan dûr xistine.

- 3 ji beşdaran îfade kirine ku wan di pêvajoya îxracê da bi hevjînên xwe ra hin tengasîyan jîyane û ji van 3 beşdaran duduyan têkilîya xwe ya zewacê parastine lê yek jê hatiye pêvajoya hevberdanê. Beşdarên din anîne ziman ku pêvajoya îxracê bandorekê li ser têkilîya wan ya bi hevjînên wan ra nekiriye.

- 4 ji beşdaran di vê pêvajoyê da alîkarîya derûnî wergirtiye, 3 ji beşdaran dermanên psîkîyatrîk bi kar anîne. Hemî beşdarên jin alîkarîya derûnî wergirtine.

- 4 ji beşdaran, piştî pêvajoya îxracê pirsgirêkên tenduristîyê jîyane ku li gorî wan ev bi stresa îxrac û piştî îxracê va girêdayî bûye.

- Herçendî ku beşdaran piştî îxracan hîsa bêqîmetbûn û ji civakê dûrxistinê jîyabe jî piranîya wan balê kişandine ser rihetî û berfirehîya jîyanê ya li bajarên kurdan.

- Herçendî ku piştî biryara Dadgeha Destûra Bingehîn hin hêvî bi beşdaran ra çêbûbin jî piranîya beşdaran di heqê vegera kar da anîne ziman ku di vê rewşa xirab ya zanîngehan da hêvîya wan zêde li wan mezin nebûye.

- Beşdaran îfade kiriye ku hîsa ku ew ê di vegerê da bijîn wê; rûmet û xurûra ku ji mafdarbûnê tê be.

- Beşdaran anîye ziman ku ji ber ku ew li bajarên kurdan dijîn û ji ber ku ew her tim bi çewisandinên nasnameyî ra rû bi rû mane, ew hînbûyê vê pêvajoyê bûne û di pêvajoya îmze û îxracê da ji vê zêdetir tiştekî hîs nekirine.

- Beşdarên jin di dema avêtina ser malan ya pêvajoya îxracan da, ji alîye derûnî va bêtir bandordar bûne.

- Di pêvajoya îxracan da ji alîyê hîsî va herî pir hîsa hêrsbûn û xeyalşikestîbûnê li beşdaran peyda bûye.

- Beşdaran îfade kiriye ku di vê pêvajoya derbasbûyî da ji alîyê xwe bihêzkirinê va wan hîn kiriye ku li ser lingên xwe bimînin, serî bi şertên zor yên jîyanê ra derbixin, bêtir bi mirovên dî ra bikevin nava têkilîyê û hev nas bikin û piştgirî bidin hev û her wiha rizgarbûna ji têkilîyên fermî yên sazîyan, jîyana rastîn bi wan daye naskirin. Ji ber vê yekê berxwedêrîya wan ya li hember jîyanê bihêztir bûye û xelasbûna ji berpisîyarîya kar rê lê vekiriye ku ew dema xwe bi aktîvîteyên civakî derbas bikin û ev pêvajo ji bo wan bûye pêvajoya hînbûnê.

## 8-2. Bandorên Aborî

- 5 ji beşdaran mecbûr mane ku piştî îxracan teqawid bibin û yek ji akademîsyenên teqawidbûyî îkramîyeya xwe ya teqawidîyê wernegirtiye.
- Ji bilî 3 beşdaran, hemî beşdarên dî dîyar kirine ku; wan nekarîye karên bi pisporîya xwe ra têkildar bibînin û lewma jî di sektorên dî da ji bo xwe li kar gerîyane.
- 6 ji beşdaran dev jê berdane ku li karek bigerin an jî hîç li karek negerîyane.
- Ji beşdarên ku zewicandî ne 12 jê hevjînên wan dixebitin. (3 beşdar hene ku ezeb in)
- 9 ji beşdaran alîkarîya sendîkayê digirin û 2 beşdarên ku ne endamên sendîkayê ne jî ji tu sazîyeke sîvîl alîkarî wernagirin.
- Piranîya beşdaran ji xizmên xwe piştgirî an jî pêşnîyaza piştgirîyê wergirtine.
- Sektorên beşdarên ku dixebitin ev in; karê dersxaneyê, perwerdekarîya ziman, kargeha salona werzîşê, karên çandinîyê, rêvebirîya di sazîyên civaka sivîl da, wergêrî û şêwirmendîya derûnî.
- Di mijara heqdestîyê da ji nava yên ku dixebitin 2 ne tê da yên dî vegotine ku ew ji ber ku BHD'yî ne bi dezavantajan ra rû bi rû mane.
- Herçendî ku beşdaran ji alîyê aborî va hin pirsgirêkan jîyabin jî piranîya wan vegotine ku piştî 3 salan wan bi alîkarîya derdor, malbat û karên ku dikin rewşa xwe sererast kirine.
- 2 ji akademîsyenan, wisa difikirin ku piştî îxracan ji bilî sendîkaya Eğitim Sen'ê tevgera sîyasî ya kurdan û sazîyên civaka sivîl bi qandî ku ew li bendê bûne li wan xwedîtî nekirine û ev sazî di vê mijarê da kêm mane.

## 8-3. Bandorên Akademîk

- Hate çavdêrîkirin ku hemî akademîsyenên îxracbûyî di zaningehan da akadmîsyenên herî serkeftî ne. Ev yek hem ji alîyê dibistanên wan va hem jî ji alîyê hejmara atifan va derbasdar e. Akademîsyenek ku îxrac bûye di zanîngeha xwe da yek ji akademîsyenê ku herî zêde li navê wî atif hatiye kirin e.
- Dema ku ji bo zanîngehên herêmê miqayeseya berîya îxracan û piştî îxracan tê kirin, tê dîtin ku di rêzkirina zanîngehên netewî da di nîsbeteke giring da ev zanîngeh paşve çûne.
- Ji alîyê hilberîna akademîk va di hemî akademîsyenan da bê îstîsna paşveçûn çêbûye, piranîya akademîsyenan bi tevahî dev ji hilberandina akademîk berdane û hêvîya xwe ji akademîyê birîne. Hin ji beşdaran anîne ziman ku ew vegerin ser karên xwe jî wê tu car wekî berê motîvasyona wan ya akdemîk tunebe.
- Ji alîyê akademîsyenên ku dixebitin va jî li gorî berîya îmzeyê di hejmara nivîsîna gotarên zanistî da daketin çêbûye. Ji vî alîyî va hate çavdêrîkirin ku ev pêvajo ji alîyê akademîsyenên ku îxrac nebûne va jî bûye sedema paşveçûnê.
- 3 ji beşdaran anîye ziman ku ew li gorî berîya îxracê di îfadekirina fikr û ramanên xwe da bêtir serbest in. Yên dî jî îfade kirine ku ew di vê pêvajoyê da di anîna ziman ya fikrên xwe da bêtir bi temkîn in û hinek jî otosansorê li ser fikrên xwe disepînin.
- Li gorî beşdaran Zanîngehên Tirkan di vê pêvajoyê da ji alîyê piştgirîkirinê va gelek qels mane û di ezmûna xwe da têk çûne. Ji bilî çend însîyatîfên alîkarîyê tu piştgirî bo wan nehatiye dayin.
- Li gorî beşdaran zanîngehên cîhanê çi ji dest wan hatiye, kirine û li gorî zanîgehên tirkan wan gelekî piştgirî dane wan.

- Nîvê beşdaran anîne ziman ku ew ji ber qedexeya derketina derveyê welat nikaribûne ji têkilîyên xwe yên derveyî sûd werbigirin û bi vî rengî ji derfetên kar û perwerdeyê bêpar mane.

- Ji %10'ê hemî akademîsyenên aşitîyê ku xwedîyê nasnava Prof. in û îxrac bûne, ji Fakulteya Fenê ya Zanîngeha Dicleyê hatine îxrackirin. Ev mamoste mamosteyên herî çalak yên beşa xwe bûne û digel ku hatine îxrackirin jî bi saya atif û referekirina navên wan di xebatên zanistî da, hê jî zanîgehên wan ji alîye krîterên rêzkirina navnetewî va ji wan sûdê werdigirin.

- Gelek xwendekarên mastir û doktorayê ji ber îxracbûna van mamosteyan êdî nikaribûne bi wan ra bixebitin û loma mecbûr mane berê xwe bidin mamosteyên ku ne pisporê mijara wan in.

- Yek ji beşdaran ji lîjneya hakeman ya kovarekê hatiye derxistin digel ku hakemtîya gotaran kiriye û qedandiye jî û projeyên TUBİTAK'ê yên du beşdaran hatine betalkirin.

## 8-4. Qewimînên Pêvajoya Îmzeyê

Di 11'ê Berfanbara 2016'an da ji bo ku balê bikişîne ser binpêkirinên mafan yên ku di demajoya qedexeye derketina derve da pêk dihatin û ji bo ku di "Pirsgirêka Kurd" da dewletê dubare li rêbazên aşitîyê vegerîne, danezana bi navê "Em ê Nebin Hevparê Vî Sûcî" ji bo raya giştî hate îlankirin û ji bo îmzeya akademîsyenan hate berpêşkirin. Di demeke kurt da hejmara akdemîsyenên ku danezanê îmze kirin gihîşte 1126'an. Di vê navberê da ji nîveka 2015'an vir va li bajarên kurdan di navbera Dewlet û PKK'ê da şer gur bûbû û êdî ji berê cudatir bajar û bajarokên kurdan bûbûn navenda şer û ji ber vê jî li van herêman ji bo civaka sivîl qedexeyên demdirêj yên derketina derve dihatin îlankirin. Binpêkirinên mafan bi vî rengî bûn; binpêkirina mafê jîyanê û mafê azadîya xwe îfadekirinê, koçberkirin, îşkence û miameleya xirab, kuştinên ne qanûnî û wekî dî jî di asteke fireh da binpêkirinên mafên jîyanî. Li gorî rapora Koma Krîzê Ya Navnetewî, ji Tîrmeha 2015'an û vir va di nava 21 mehan da herî kêm 2748 kes mirin, nêzî 100.000 kesî bê mal man û nêzîkê 400.000 kes bi awayek demkin ji şûnwarên xwe hatin dûrxistin.[1] Li gorî rapora Şûbeya Amedê ya KMM'yê (İHD) 320 kesên ku mirine sivîl bûne û 75 ji vanan zarok bûne.[2] Ji ber ku şer di navenda bajaran da diqewimî ne pêkan bû ku sivîl û şervan ji hev bêne cudakirin û ev yek jî nîşan dide ku bi îhtîmalek mezin hejmara sivîlên ku mirine zêdetir be. Di pêvajoya şer da li 40 bajarokan qedexeyên derketina derve hatin îlankirin ku demajoya wan di navbera çend saet û çend mehan da diguhere.[3] Hin taxên van bajaran bi tevahî hatin valakirin û piştî şer bi tevahî bûn xerabe. Metna bi navê "Em ê Nebin Hevparê Vî Sûcî" di binê sîya vê pêvajoyê da wekî metneke mixalefetê derkete. Yên ku dewletê bi rê va dibirin jî di xeteke dîyar ya polîtîk da biryar dabûn û ev xet

1 *https://www.crisisgroup.org/tr/europe-central-asia/western-europemediterranean/turkey/253-managing- turkeys-pkk-conflict-case-nusaybin dîroka têkilîyê 08.03.2020.*

2 *https://hakikatadalethafiza.org/wp- content/uploads/2016/09/2016.08.30_IHD_CatismaliOrtam_Y%C4%B1ll%C4%B1kBilanco.pdf dîroka têkilîyê 08.03.2020*

3 *https://tihv.org.tr/tag/sokaga-cikma-yasaklari/ dîroka têkilîyê 08.03.20*

bi tevahî berevajî daxwazên kesên ku îmze avêtibûn metna aşitîyê bû. Dewletê di asta herî jorîn da hemen bertek li hember danezana aşitîyê nîşan da û Serokkomarê wê heyamê, kesên ku metnê îmze kirine hedef girt û ji bo wan wiha got: "Ev rewşenbîrên miswede rabûne dibêjin ku dewlet komkujîyê dike. Ey rewşenbîrên miswede hûn ne ronî ne tarî ne. Hûn ne rewşenbîr in."[4] Dîsa di heman rojê da Serokkomar daxuyanîyek wiha da: "Ez bawer dikim wê sazîyên me yên têkildar jî li hember vê îxaneta ku li gorî destûra me ya bingehîn û qanûnên me bi rengekî aşkera sûc e, çi lazim be bikin." û bi vî rengî ji bo kesên ku îmze avêtine mesaj da sazîyên dadgerîyê. Piştî van daxuyanîyên Serokkomar, li hemberî kesên ku îmze avêtine, ji alîye partîyên sîyasî, Sazîya Perwerdekarîya Bilind (YÖK) û zanîngehan va kampanyaya reşkirin û bêrûmetkirinê dest pê kir û ev akademîsyen wekî hedef hatin nîşandan. Hin rojnameyan manşetên wiha avêtin: "Hevparên Sûcên PKK'ê", "Îmzeavêjên Xayin Aşiqên Ermenîyan Derketin", "Dirêj nekin, Van Kesan Ji Zanîngehan Bavêjin", "Bila Herin Derkevin Serê Çîya". Serokkomar jî cara sêyemîn kesên ku îmze avêtine kire hedef û ji bo wan wiha got: "Zalim û Alçax in!" Di vê pêvajoyê da gelekî zanîngehan di heqê kesên ku îmze avêtine da lêpirsîn dan destpêkirin. Di vê navberê da wekî bertekek li hember van helwestan, hejmara kesên ku îmze avêtine gihîşte 2112'an. Li zanîngehan jî çewisandin hatin kirin ku îmzeavêj ji kar werin derxistin, peymanên wan neyên dirêjkirin. Lêpirsînên ku ji alîyê dozgeran va hatibûn vekirin hemî di bunyeya Dozgerîya Komarê ya Stenbolê da hatin civandin û kesên ku îmze avêtine li gorî xala 7/2 ya Destûra Têkoşîna Li Dijî Terorê (TMK) ya bi hejmara 713, bi îdîaya "propagandaya rêxistinê", bo îfadeyê hatin vexwendin. 4 akademîsyen di 31'ê Adarê da hatin girtin û piştî ku nêzî 40 rojan di girtîgehê da man serbest hatin berdan.

Dema ku me di xebata xwe ya sehayê da pirsên di heqê vê pêvajoyê da ji akademîsyenan kir, piranîya wan anîn ziman ku wan pêvajoya îmzeyê wekî berpirsîyarîyek li hember mafên mirovan dîtiye û bi vê hişmendîyê fikirîne ku ev helwesta yekane ye ku ew dikarin nîşan bidin û bi piranî ne li bendê bûne ku dê ev metin

4 *http://www.agos.com.tr/tr/yazi/13975/erdogan-baris-icin-akademîsyenler-i-hedef-aldi-aydin-degil-cahilsiniz*

û îmze ev qasî deng bidin. Beşdarê 1. ku ji bo vê danezanê îmze daye anî ziman ku dema ku wî metnê xwendiye wisa hîs kiriye ku metneke giran e lê dûre fikirîye ku tiştên ku diqewimin ji vê girantir in û lewma biryar daye ku metnê îmze bike. Vî/Vê beşdarî/ê wiha berdewam kir:

*"Mesele mirina Cemîle li min pir giran hat. Mesela karmendên dewletê ji bajêr dihatin derxistin û gel li wê derê dima, ev li min pir giran dihat. Dewletê karmendên xwe ji bajêr derdixist lewma di nava wan da bîyanî hebûn lê zarokên gel li wir dihatin hiştin. Eger ku hemîyan derxistana dibû lê xuya bû ku hin ji wan ji bo dewletê bêtir bi qîmet bûn. Ji ber van yekan min îmze avêt."*

Beşdarê 2. anî ziman ku ew wilo difikirî ku metnên bi vî rengî bi piranî encamek ji wan dernayê û lewma jî wî/wê ev metin wekî gelekî metnên bi vî rengî ji rêzê dîtiye û bêyî ku zêde li serê bifikire îmze avêtiye.

*"Di nava îslamîstên Tirkîyê da meseleyeke navdar heye. Dibêjin yanê morîstankek ketiye rê ku here Hecê lê pê henekê xwe kirine û jê ra gotine tu yê nikaribî bigihîjî Hecê. Morîstankê gotiye tişt pê nayê, qet nebe ez ê di vê rêyê da bimirim. Ez jî hinekî wisa me. Qet nebe min gotina xwe got. Ne ku min wisa bawer dikir ku dê ji vê yekê encamek derbikeve an jî desthilatdarî wê li xwe vegere û dev ji qedexeyên derketina derve berde. Min tiştek wisa ji deshilatdarîyê hêvî nedikir lê ji bo ku ez jî gotina xwe bibêjim min îmze avêt vê metnê."*

Beşdarê 3. anî ziman ku ew wisa fikirîye ku çiqas hejmara kesên ku îmze avêtine pir bibe wê hem bi giştî û hem jî ji bo zanîngehan ew çend zehmet bibe ku li hember van kesên ku îmze avê binpêkirnên mafî û çewisandinan pêk bînin û lewma wî bi hîsa piştgirîdanê ji bo ku hevalên xwe bi tenê nehêle îmze avêtiye metnê.

*""... hejmara yên ku însîyatîf hilgirtine çiqas kêm bimîne dê ew çend bi ser wan da herin. Ez fikirîm ku ew bi tenê bimînin wê bi miameleyên girantir ra rû bi rû bimînin. Motîvasyona min ya bingehîn ev bû. ...Di*

***destpêkê da ez hinek sar bûm. Min dît ku Serokkomar heqaretan li kesên ku îmze avêtine metnê dike. Min weşanên televîzyonan temaşe kir. Min tehdîdên Sedat Peker dît û dûre min biryar da ku ez îmze bikim. Min di koma duyemîn da îmze kir."***

Li gorî beşdarê 5. ne pêkan bû ku ew li hember qewimînên ku li herêma wan pêktên bêdeng bimînin. "Divîya me tiştek bikira, her roj her kes dimir û dema ku ev metin derket meydanê me got, aha ev e tişta ku em lê digerîyan. Xwezî ev metin ji vê derê derketana. Carina ez vê ji xwe ra dibêjim û bi hevalan ra parve dikim... Xwezî em bikaribûna li hev bicivîyana û me metnek wiha binivîsîya." Beşdarê 6. jî dîsa bi heman rengî dîtinên xwe anî ziman: "Tu dibê qey qîyamet rabûbû. Erda ku me serê xwe dida serê bi teqîna bombeyan dihejîya. Ew roj min şerm kir. Min ew çend şerm kir ku hê jî dema tê bîra min şerm dikim. Bi miraq min li rûyê mirovan nihêrî da ku têbigihîjim ew çi hîs dikin. Herkesê şerm dikir. Em di demeke wisa da dijîyan ku me nekarî em tiştek bikin û metnek wiha hate pêş me. Li navenda bajêr şer û pevçûn hene û her roj mirov dimirin. Cesedên wan li ser erdê dimînin. *Însanan zarokên xwe xistine dolaba cemedê û hûn nikarin tu tiştekî bikin. Hingê metneke îmzeyê hate pêş me. Me got em îmze bikin belkî bi kêrî tiştekî bê.* Motîvasyona min ya bingehîn ev bû."

Beşdarê 10. jî balê dikêşe ser motîvasyona piştgirîdanê û wiha dibêje:

***"... jixwe ez di nava dojehekê da bûm... û bêtir ez difikirîm ku dostên me, hevalên me yên akademîsyen yên li alî Tirkîyê îmze bikin wê çêtir be. Di rewşên wiha da çend roj şûn da em jî li ser navê piştgirîdanê, bêyî ku em tu tiştî bifikirin, îmze dikin jixwe. Ya rast ez bejim; min metnê jî zêde nexwend, jixwe îcab nedikir mirov bi zêr û ziber bixwîne. Wekî helwestek, pir giring bû û hê jî giring û bi qîmet e. Sedema bingehîn ev bû ku em dengek derxin li hember komkujîyê. Lewre demeke wisa bû ku herkes bêdeng bû."***

Beşdarê 12. anî ziman ku; *cihê ku ew lê dijîya herêma şer bû û vê yekê bandorê li helwesta wî kiriye. Wan ji tu derê talîmatek negirtiye û bi tenê destê xwe dane ser wijdanê xwe û ji bo ku bikaribin bikevin pêş mirina însanan û rê lê vebikin ku pêvajoya aşitîyê ya di navbera salên 2013-2015'an da dîsa vegere îmze avêtine.* Ligel vê jî anîye ziman ku şerê ku diqewimî û dengê çekan li wan û zarokên wan bandoreke derûnî kiriye û wan nekariye vê rewşê ji zarokên xwe ra rave bikin. Ji bilî vê anî ziman ku; "guleyên çekan li odeyên wan û lojmanên wan yên zanîngehê diketin û li xeraca zanîngehê hevalek wan birîndar bûye û tiştên bi vî rengî gelekî bandorê li wan kirine û ne însanî û wijdanî bûye ku ew çavê xwe ji van tiştan ra bigirin."

Beşdarê 14. atmosfera wê demê wekî atmosferek şîzofrenîk pênase kir û wiha got: "Li alîyek dengê bombe û pevçûnan û li alîyê dî wekî ku tu tişt nebûbe em diçûn diketin dersan û ev nakokîyeke mezin bû. Ya rast avêtina îmzeyê li hember vê rewşa giran teşebusekî hêsan bû."

Beşdarê 16. jî bi piranîya beşdarên dî ra hemfikir e ku; " ew nefikirîye ku wê danezan ev qasî deng bide. Ya rast piştî ku ew wekî hedef hatin nişandan zêdetir deng daye." Herwiha wî anî ziman ku ew li cihê bûyerê dijîyan û yên ku herî zêde dilê wan dişewitî yên vê herêmê bûn.

Beşdarê 18. digel ku kesekî apolitik bûye jî sedema xwe ya îmzekirina metna aşitîyê wiha rave dike:

***"Ez ji alîyê wijdanî va ne rihet bûm. Mirov li wê derê dimirîn û me nikarîbû tu tiştek bikira û vê yekê pir bandorê li min dikir. Ew pêvajo ji bo min pêvajoya bûhranê bû. Carina mirov nikare vê ji mirovan ra rave bike, dibêjin ku çi bi te bûye, erê nasek min xizmek min tune li wir lê mirov ji alîyê wijdanî va nerihet dibe. Ya dî jî tu wan dibînî, wan dengan dibihîzî wekî dêyek wekî jinek tu empatî dikî bi wan ra. Li wê derê mirov dimirin zarok dimînin li wê derê, zarok dimirin. Li wê derê mirov dijîn û jîyana wan di binê xetereyê da ye. Lewma tu jî nikarî bêjî ez jî rûnêm û li xebata xwe binêrim. Çend caran hevalên min hatin û dîtin ku ez***

*digirîm û ji min ra bi rastî jî digotin, çi bi te bûye. Rewşa min ya aborî baş e, standardên jîyana min baş in, li gorî standardên Dîyarbekir baş e, xanîyê min erebeya min heye, zarokên min hene û tu pirsgirêkek min tune lê dilşadîya takekesî têr nake, heya ku tu wekî civak dilşad nebî... Dev ji dilşadîyê berde, dema ku li wê derê hin kes dimirin tu nikarî dilşad bibî. Min ev travmaya mezin dijîya yanê ez difikirîm ku karim çi bikim. Wekî ku min got ji alîyê sîyasî va ne kesek aktîf bûm, tevli tu aktîvîteyê nabim, tu tiştekî nakim. Jîyana min pir normal û rûtîn bû. Lê di wê pêvajoyê da min bi xwe nikarîbû. Dema ku ez wisa difikirîm ku dikarim çi bikim, hingê ew metna îmzeyê derkete pêş min. Ez nefikirîbûm ku dê ev çend deng jî bide. Ez fikirîm ku îmzeyek e di dawîyê da, ma wê çi bibe. Tenê ev hebû, min digot belkî hin kes bibihîzin û çareserîyek bê dîtin. Lewre min dinihêrt ev çend tişt diqewimîn lê tu êvarê têyî li televîzyonê dinihêrî tu tişt tune. Herkes di nava jîyana xwe ya normal da ye. Bernameyên şahîyan hene. Kes ji van tiştên ku diqewimin ne agahdar e. Min wê îmzeyê bi hîsên ku belkî hin kes hin tiştan bibihîzin, belkî rayedar bibihîzin û hin tiştan bikin avêt."*

## 8-5. Têkilîya Îmze Û Aîdîyetê

Me di vekolîna xwe da ji beşdaran pirsa aîdîyetê û bandora wê ya li ser avêtina îmzeyê pirsî. Di heyameke ku Tirkîye li derdora nasanameyan ji hev dûr dikeve, sîyaset di nasnameyan da asê dibe, beşdaran ji me ra anîn ziman ku bi piranî aîdîyetên wekî kurdbûn, tirkbûn, elewîbûnê di îmzeavêtina wan da ne bi bandor bûne. Beşdarên ku bandora aîdîyetê qebûl kirine, anîne ziman ku bandora wê bi tenê qismî bûye û aîdîyet ne dîyarkereke bingehîn bûye di îmzeavêtina wan da. Ji alîyek va dikare bê dîtin ku metna îmzeyê, li Tirkîye ya ku di çarçoveya sîyaseta nasnameyan da tengijîye, wekî platformekî ye ku li wê derê beşên cuda yên civakê gihîştine hev. Beşdaran îfade kiriye ku li hember êş û azarên ku li vê derê diqewimin, ji rojavayê welat jî dengek hatiye û bi piranî ev însîyatîf *ji nasnameyan azad, li ser bingehên mirovî û mafan* pêk hatiye.

Beşdarê 1. wiha behsa bandora nasnameyê kir:

***"... ez ne li ser wê fikrê me ku kurdbûna min, min mecbûr dike ku ez raya xwe bidim HDP'ê. Ji bo min xwendekarê kurd jî turk jî eynî ne. Lê bêguman bandora çepgirbûnê, xwe ji wî alîyî va pêşxistinê, hebû. Ev yek li bajarokeke Ispartayê jî bihatana jîyîn min ê îmze biavêtana. Ez ji ya gerdûnî bawer dikim. Eger ku li Ispartayê dayikek mecbûr mabe qîza xwe di dolaba sarincê da veşêre ev yek li Ispartayê be jî li Şirnexê be jî min ê îmze biavêta."***

Beşdarê 2. îfade kiriye ku bandoreke nasnameyê hebe jî ev ne erênî ye.

***"Ez kurd im, elewî me lê mesela min ev yek ferq kir. Dema ku ez parastina gelekî dî dikim xwe bêtir rihet hîs dikim. Dema ku min parastina kurdan dikir, ez difikirîm ku gelo ev neteweperestî ye? Lewma jî eger ku bandoreke nasnameyê çê bûbe jî ev bandoreke neyênî ye. Lê di encamê da rast e ku di metna îmzeyê da kurd di navendê da bûn lê dîsa jî berevanîyê ji azadîya hemî gelan ra dikir.***

Beşdarê 6. anî ziman ku rast e di nava kesên ku îmze avêtine da hin mamosteyên ku ne kurd in heta kesên ku zêde bi van meseleyan ra eleqeya wan tunene, ji xwe ra di goşeyê xwe da ne, hene û dibe ku ev ji ber wê yekê be ku tiştên diqewimîn ew çend giran bûn ku heya li wan kesan jî bandorê kiribûn. Ji bilî vê beşdar îfade kiriye ku di nava kesên ku îmze avêtine da gelek kes hene ku kurd in an jî di vê meseleyê da birîna wan heye lê ew gewdeya esasî ya îmzeavêjan pêk nayinin û hejmara wan sînordar e.

***"ji nasnameya etnîk bêtir bandora nasnameya polîtîk hebû û vê nasnameya polîtîk di meseleya kurdan da sekna dewletê nedieciband û dixwestin ku mesele ne bi rêyên tedbîrên ewlehî û bikaranîna şîdetê lê bi perspektîfeke demokratik bê çareserkirin û di nava vanan da ekolên lîberal û femînîst jî hebûn lê bi piranî ew kes bûn ku ji kevneşopîya demokratên civakî û çepgir-sosyalîst dihatin."***

Beşdarê 7. anî ziman ku di nava îmzeavêjan da kesên wekî misilmanên bawermend, sosyalist, kurd, çerkez û ereb hebûn yanê kesên ji cîhetên cuda tevli vê tiştê bûn û ji ber vê jî hevparîya wan ev bû ku; *ev tiştên ku diqewimin nayêne qebûlkirin, berevajî rûmeta mirovahîyê ne û sûc in* lewma jî lazim e ku li hemberî wê dengek bê dayin.

Beşdarê 20. di heqê bandora nasnameya kurdbûnê da wiha axivî:

***"Di dawîyê da nasnameyeke we heye; kurdbûn û li hember vê nasnameyê hisiyatên we hene. Lê dîsa jî eger ku ev tiştên qewimîn li dereke dî jî buna min ê îmze biavêtana. Ne ji ber ku ev bi kurdan ra eleqedar bû min îmze avêt, ji ber ku ev bi mafên mirovahîyê ra eleqedar bû, ji ber ku ev bi heq û hiqûqê ra eleqedar bû min îmze avêt. Lewma jî eger bandora nasnameya min hebe jî dîyarkera bingehîn ji nasnameya min bêtir sekna min a mirovî bû. Nasnameya min kurd e lê kurdbûn ne dîyarkera bingehîn ya hemî jîyana min e. Hin nirxên dî jî hene. Nirxên wekî heq, hiqûq û edaletê jî bandorê li sekna min a sîyasî dikin.***

09

# Pêvajoya Îxracê û Bandorên Wê

Binpêkirinên mafî yên Akademîsyenên Aşitîyê ku îmze avêtine metna îmzeyek ji bo aşitîyê, ne tenê bi pêvajoya îmzeyê bi sînor mane. Encameke giring ya ku vê vekolînê tesbît kiriye ev e ku; pêvajoya binpêkirinên mafî bi pêvajoya îxracê dijwartir bûye. Tevî bandorên wê yên derûnî bi vê pêvajoyê mafên wan yên xebatê ji wan hatiye girtin, mafê geşt û gera azad ji wan hatiye sendin ku ev li dijî mafên destûrî ye, li kêleka bandorên dûdirêj yên derûnî jîyana wan ya civakî jî hatiye tehrîbkirin/xerakirin.

## 9-1. Bandorên Derûnî

Di pêvajoya îmzeyê da bi piranî li akademîsyenan lêpirsîn hatin vekirin, peymana wan ya kar hate betalkirin, ji civînên zanistî hatin derxistin û bi curbecur çewisandinan ra rû bi rû man lê çewisandinên mezin û îxrackirin, bi îlana RA'yê (Rewşa Awarte) a piştî teşebusa darbeya 15'ê Tebaxê pêkhat. Digel ku teşebusa darbeyê tu têkilîya xwe bi îmzeavêjan ra tunebû jî dewletê van şertên nû wekî fersendek bi kar anî ji bo ku îmzeavêjan ji karên wan dûr bixe. Bi BHD'yên li dû hev tevî hev 406 akademîsyenên îmzeavêj ji kar hatin avêtin. Ji 56 zanîngehên dewletê 391, ji 4 zanîngehên weqfan 8 kes û ji wezaretan jî 7 kes hatin îxrackirin.[5] Bi BHD'yan hate qedexekirin ku ev kesên îxracbûyî li sazîyeke dewletê an jî di karekî bi sîxorte da bixebitin. Akademîsyenên îmzeavêj ku ji Zanîngeha Dicleyê hatibûn îxrackirin li kêleka doza ku li Stenbolê bi tawana "propagandaya rêxistinê" li wan hatibû vekirin, di dîroka 1'ê Gulana 2017'an da, bi îdîaya endamtîya rêxistinê bi ser mala wan da hate girtin û rojeke temam di binçavan da man. Paşê ev lêpirsîn bi bêtaqîbîyê bi encam bû.

Ji zanîngehên herêmê jî tevî hev 78 akademîsyen hatin îxrackirin. Ev hejmar dema ku li gorî nîsbeta hindik ya zanîngehên herêmê û nîsbeta hindik ya personelên akademîk bê fikirîn hejmareke giring e. Akademîsyenên ku ji herêmê hatine îxrackirin ji alîyê asta akademîk va ji alîyê weşanên akademîk va mamosteyên bi qabilyet û bi qidem bûn lewma jî îxrackirina wan ji bo zanîngehên herêmê tê wateya qeybeke giring.

5 *https://www.tihvakademi.org/wp-content/uploads/2019/03/Barisicinakademîsyenlervakasi.pdf*

Digel ku piranîya beşdaran îfade kirine ku wan pêvajoya îxracê bi şaşwazîyeke mezin pêşwazî nekirine û ew li bendê bûne jî dîsa jî dema ku wan cara ewil vê bihîstîye gelekî li ber ketine. Piranîya akademîsyenan îfade kiriye ku di vê pêvajoyê da jîyana wan ji bingehê da guherîye û rûbirûyê gelekî pirsgirêkên cuda bûne. Piranîya beşdaran anîye ziman ku wan ji derdora xwe û malbata xwe piştgirî dîtiye û îxracbûna wan ji bo wan di nava civakê da nebûye hêmaneke çewisandina wan, bereksê vê wan bi rihetî vê îfade kiriye. Heta wan çavdêrî kiriye ku kesên ku di çarçoveya "Teşebusa Darbeyê ya 15'e Tebaxê" da li herêmê hatine îxrackirin jî li gorî herêmên dî bêtir rihet bûne. Hin beşdaran anîye ziman ku ew di nava malabata xwe da bi pirsgirêkên cidî ra rû bi rû mane û 3 beşdaran bi hevjînên xwe ra ji ber giranîya vê pêvajoyê pirsgirêk jîyane û beşdarek jî vegotiye ku tevî hin pirsgirêkên dî jî bi bandora vê pêvajoyê zewaca wî bi dawî bûye. Beşdarek dî jî anîye ziman ku di vê pêvajoyê da hevjînê/a wî mecbûr maye ku piştgirîya psîkîyatrîk werbigire. 4 ji beşdaran anîye ziman ku wan piştgirîya psîkîyatrîk wergirtiye û 3 ji beşdaran jî tedawîya dermanan wergirtiye.

Beşdarê sêyemîn anîye ziman ku "ew piştî îxracê li gorî berê mecbûr maye zêdetir bixebite û vê yekê sîstema wan ya malbatî xera kiriye. Wî/Wê îfade kiriye ku dema ku di zanîngehê da bûye karê wan hêsantir bûye û wî karîbûye wext bide malbata xwe û bi wan ra eleqedar bibe lê di rewşa niha da ev rihetî tune û ew li gorî berê bêtir dixebite lewma jî ev yek di nava malbatê da dibe sedema nerihetîyan."

Pêvajoyên îxracan bi piranî gihîştîye sala xwe ya sisêyan û me çavdêrî kir ku yên ku îxrac bûne şaşwazîya pêşîn ji ser xwe avêtine û bi rengekî bi kar û barekî ra mijûl dibin. Pêvajoya îxracê hinekî tehde li ser wan çêkiriye lê di heman demê da ji hin alîyan va jî hêz daye wan. Hema bêje hemî beşdaran îfade kiriye ku wan ji malbatên xwe piştgirî dîtine.

Beşdarê 4. di heqê avantajên jîyana li herêmê da wiha axivî:

*"Di pêvajoya îxracê da hin kesên ku newêribûn silav bidin me jî hebûn û yên ku em hemêz kirin jî hebûn. Ji vî alîyî va li Dîyarbekir/Amedê em bi sûd bûn. Li rojava ev pêvajo ji bo yên ku îxrac bûne bêtir dijwar bû. Li vê derê mesela tu diçî ba esnafekî. Mesela esnafê ku min danûstandina xwe li ba wî dikir rojekî miraqa min dike û pirsa min dike. Dema ku min ji wî ra got ez îmzeavêj im wî bi rengekî germ nêzîkahî li min kir û ji min ra got; tu ji me yî. Li Dîyarbekirê miheqeq ev mexdûrîyet hatiye serê herkesê. Yan hatiye girtin yan hatiye kuştin yan hatiye binçavkirin yan ji kar hatiye avêtin. Ji ber vê ye ez dibêm ev bajar li gorî yên din hîn bêtir hestiyar e. Lê li sazîyên bajêr heman hestiyarî tune û ji vî alîyî va bi ya min kêmasîyek heye."*

Dîsa beşdarê 3. behs kiriye ku wî dema ku xanî kirê kiriye yê di navberê da ji bo komisyona ku tê dayin pir alîkarî bo wî kiriye. 6 heb beşdaran di heqê rihetîya derûnî ya herêmê da wiha fikrên xwe anîn ziman:

*"Wekî kesek îxracbûyî tu tiştekî neyênî nehate serê min. Ez dibêm em, yên ku li Dîyarbekirê/Amedê dijîn hinekî bêtir bi sûd in. Li kolanê, ji derdora xwe min ji tu kesî titşek neyênî wernegirt. Bereksê vê (îxracbûna me) ji bo me wesîleya xurûrê bû. Herkesê dizanîbû ku îxracbûna me ji ber kurdbûna me, mixalifbûna me ye. Lewma jî ji alîyê derûnî va encamên wê yên erênî çêbûn. Em bi vê şanaz bûn û her kesê zanibû ku me tiştek ku serê me bixe ber me nekiriye û bereksê vê wan dizanîbû ku em ji ber karekî ku li faydeya civakê ye hatine îxrackirin. Hin hevalên min dixwestin bi taybetî bo min titşek bikin û digotin; we vê îmzeyê ji bo şexsê xwe neavatiye, li vê derê qîyamet rabûbû loma we ev îmze avêtiye. Di vê maneyê da ez rastî gelekî reaksîyonên erênî hatim."*

Beşdarê 11. di vê mijarê da rihetîya derûnî bi pirbûna hejmara îxracan yên li herêmê va girê da û wiha got:

*"Li Dîyarbekirê/Amedê ji mamosteyên ku îxrac bûne heya bi yên ku ji şaredarîyê îxracbûne hejmareke gelekî zêde hebû û hema bêje herkesê vê pêvajoyê jîyabû lewma jî em rûbirûyê miameleyeke nebaş nehatin. Ev jî cudahîya Dîyarbekirê/Amedê bû."*

Beşdarê 12. xwedîderketina herêmê li kesên ku îxrac bûne wiha îfade kir:

***"Bi qandî ku ji çapemenîyê dibihîst mesela li bajarên dî bav bi kurê xwe ra naaxive, jin û mêr ji hev vediqetin. Mirovên dî (yên îxracbûyî) bi tevahî terorîze dikin û dixine qalibekî. Di vê mijarê da em li vê derê rihet in û tiştên wiha nehatin serê me. Berevajî vê mirov li te xwedî derdikevin. Dema ku tu ji wan ra dibêjî ez îxrac bûme xemgînîya xwe tînin ziman. Lê li herêmê ne bi tenê akademîsyen, herwiha ji gelek sektorên dî jî gelek kes îxrac bûbûn û ev bûbû tiştekî rûtîn û normal."***

Beşdarê 13. ku piştî îxracê mala xwe bar dike derveyî herêmê, di heqê cudahîya herêmê da wiha dibêje:

***"Dezavantaja jîyana li derveyê herêmê ev e. Wekî mînak eger ez li Dîyarbekirê/Amedê bijîyama min ji herkesê ra bê terdud dikaribû bigotana ez BHD'yî me. Li vê derê li pola ku ez perwerdeya xwe lê berdewam dikim bi tenê kesek dizane ku ez BHD'yî me. Ez wê pêdivîyê dibînim ku BHD'yî bûna xwe veşêrim û naxwazim ev belav bibe."***

Vê rihetîya ku di asta civakî da tê dîtin di zanîngehan da nayê dîtin û akademîsyenên îmzeavêj heman piştgirîyê ji hevkarên xwe nabînin. Li zanîngehan ji bilî çend kesan, ji hevkarên xwe piştgirî nabînin û hevkarên wan xwe ji wan dûr dixin. Ji vî alîyî va gelekî akademîsyenan anîn ziman ku ew li hember hevkarên xwe hîsên şikestinê, xeyalşikestî û hêrsê dijîn. Ji bilî vê nêzîkî nîvê beşdaran îfade kirin ku wan di demên destpêkê da bi hawayek xwe di malê da girtine û demekê bi hîsa bêqîmetîyê jîyane herweha gelek qîmet bi nasnavên akademîk û etîketan va tê dayin.

Beşdarê 14. tîne ziman ku wî piştî îxracê jî xwestiye xebatên xwe yên akademîk berdewam bike lê êdî ev wekî berê ji bo wî ne zêde tetmînkar bûye. *"Eger ku tu ne di nava akademîya formel da bî tiştên ku tu dikî di derdora akademîyê da zêde qîmet pê nayê dayin û di vê maneyê da ji alîyê akademîk va bêqîmetbûn çê dibe."*

Beşdarê 21. di heqê tengavîyên derûnî û malbatî yên piştî îxracê da wiha axivî:

***"Malbata min pir di binê bandora vê pêvajoyê da ma. Lewre ev hîs bi wan ra çêbû ku keda me ya bi salan berhewa dibe lê dîsa jî teslelî didan min ku qet nebe ez neketime hepsê an jî hin tiştên ji vê xirabtir nebûn. Digotin ku tê bi rengekî vegerî. Îxracbûna min ji min bêtir li hevjîna/ê min giran hat û dema ku nûh bihîst pir girîya. Ji min bêtir di binê bandora vê pêvajoyê da ma. Têkilîyên min yên bi derdora min ra jî guherîn. Ez peywirdarê vekolînê bûm û hurmeta mirovan ji vê ra hebû. Bêguman akademya bi tenê bi zanîngehan ne bi sînor e lê ez hê xwendekarê doktorayê bûm û lewma nasnaveke min ya akademîk jî tunebû. Yek carî tu xwe di nava valahîyekê da dibînî. Yek jî li derdora we hin mirov hene ku qîmet didin karîyerê û dahata wê ya aborî. Ji vî alîyî va hin jî bi hîsa liberketinê li we dinihêrin. Ev yek bi min xweş nedihat. Wekî ku ezê berê û ezê niha ne heman kes bin helwest nîşan didan. Ya rast ez heman kes bûm. Fikirên min û nasnameya min eynî bûn. Bi tenê ji karê xwe hatibûm avêtin. Hevjîna/ê min jî ji ber ku di heman demê da li malabata xwe jî dinihêrt tengavîyên me yên aborî zêdetir bûn, em mecbûr man mala xwe bar bikin û di vê serdemê da têkilîyên min yên bi hevjîna/ê min ra hem ji ber ku ez bêtir hestiyar bûbûm û hem jî ji ber egerên civakî-aborî xera bûn."***

Pêvajoya îxracê ji bo piranîya beşdaran gelekî dijwar derbas bûye, ji jîyana rojane bigire heya têkilîyên kar û malbatî bandorên wê yên cuda çêbûne. Çavdêrîya ku me di piranîya beşdaran da kir ev bû ku bi taybetî ji neqilkirinên wan yên serdema ewilîn dîyar dibe ku ji alîyê derûnî va gelek tesîrdar bûne. Her ku pêvajo dirêj bûye berê xwe dane mecra û karên cuda. Hin ji wan tercîh kirine ku teqawid bibin hin ji wan jî qet neketina hewldana dîtina karekî dî. Di encamê da bandora herî giran ya derûnî li ser beşdaran ev e ku ji bilî 3 beşdaran hemî beşdarên dî êdî bi karên akademîk ra mijûl nabin û nasnameya wan ya akademîk her ku diçe diçilmise û mecbûr dimînin xwe hînê rêbazeke dî ya jîyanê bikin. Herweha akademîsyenên ku îxrac bûne anîne ziman ku ew ji hin alîyan va li gorî berê bêtir bi hêz bûne û wê derfetê dîtine ku ji derveyê perspektîfa teng ya akademyayê jî li jîyanê binihêrin. Hin beşdaran

îfade kir ku hin alîyên wan yên cuda pêş ketiye û wan giringîya piştigirîyê fêm kirine û lewre jî li gorî berê di heqê bûyerên civakî da bêtir hestiyar bûne. Em dikarin bibêjin ku ev pêvajoya îxracan ku nêzî sê salan e berdewam e ji bo akademîsyenan hem gelekî giran derbas bûye hem jî gelekî alîyên wê yên ku hêz daye û hîn kiriye çêbûne.

Beşdarê 6. di heqê alîyên ku hêz daye wan da wiha axivî:

***"Bi îhtîmaleke mezin qezenca me ya mezin berxwedêrî bû. Ez dizanim ku ez li hember jîyanê bêtir li ber xwe didim. Ev qabilyeta me ya nîşandana berxwedêrîyê pêş ket. Ya duyem hin alîyên akademyayê ku mirov kor dikin jî hene. Tu dikevî rûtînekî. Di vê rûtînê da konforek jî heye. Karekî te yê rûtîn heye, nîzameke te ya rûtîn heye. Tu rihetî û di jîyana te da nedîyarî tune. Lê alîyeke monoton/yeknesak yê vê rûtînê jî heye û di nava neynokan da dibêjim alîyeke wê heye ku te ji gelekî qabilyetan mehrûm dihêle. Rûtîn ne tiştekî wisa ye ku te pêş bixe. Halê wê yê monotonî û ji hilberînê dûrxistinê heye ku di her warî da ev wiha ye... Jîyana di halê krîzê da mirov pir diwestîne û ev sê sal e ez wekî dîn û haran dixebitim û tu car ev qasî newestîyame. Lê alîyekî erênî yê vî tiştî jî heye, te ji nava monotonîyê derdixe û tu ferq dikî ku eger tu bi kar bînî gelek qabilyetên te hene."***

Piştî ku Dadgeha Destûra Bingehîn di heqê metna "Em ê Nebin Hevparê Vî Sûcî Da" biryar da ku ew di çarçoveya mafê îfadeya azad da ye û ne sûc e, her çendî ku hin ji beşdaran pê bawerî neanîbin jî di piranîya beşdaran da ew hêvî çê bûye ku wê vegerin karên xwe. Hate çavdêrîkirin ku bi vê biryarê morale beşdaran zêdetir bûye.

Beşdarê 4. di heqê hîsên xwe yên wexta vegera li kar wiha got:

***"Em ê serbilind, bi xurûr û rûmeta xwe vegerin ser karê xwe û em ê li hember hişmendîya kevnar ya li wê derê têbikoşin."***

Beşdarê 3. îfade kir ku ew ê di vegerê da bi rihetbûneke bi xurûr û bi hêza ku wî heya wê demê li ser pîyan hiştiye vegere ser karê xwe.

Pêvajoya îxracê ji vî alîyî va *xwestiye ku akademîsyenan mehkûmê mirina medenî bike û her çendî ku demekî di vê yekê da bi ser ketibe jî bi qandî ku me di beşdaran da çavdêrî kiriye her ku dem derbas bûye ew bêtir li jîyanê vegerîyane û ji alî derûnî va bêtir li xwe hatine.* Beşdarên ku ji alîyê moral û piştgirîyê va bêtir bi hêz bûne her çendî ku dile wan ji hin alîyan mabe jî piranîya wan îfade kirine ku ew xwe serbilind hîs dikin û di heqê vegera li kar da bi hêvî ne.

## 9.2 Bandorên Aborî

Herwekî ku me li jorê îfade kir herçendî ku ji alîyê aborî va standardên akademîsyenên îxracbûyî ketibin jî ji ber bandora erênî ya têkilîyên xizmantîyê yên herêmê û nêzîkatîya erênî ya mirovan tê dîtin ku ew bi awayek li ser pîyan mane. Digel ku em vê tesbîtê dikin jî curbercur rewşên ku beşdaran di vê mijarê da îfade kirine ev in; *"demeke dirêj li kar gerîn, mecbûrmayina bi heqdesteke kêm xebitîn, mecbûrmayina di karekî li derveyê pisporîya xwe da xebitîn an jî ji ber bilindîya qidema akademîk zehmetîya dîtina karekî, hundakirina hêvîya dîtina karekî"*

Beşdarên ku îxracbûne anîne ziman ku ew ji ber egerên aborî di destpêkê da mecbûr mane ku mala xwe bar bikin, wan di dayina deynên xwe yên kredîyan û mesrefên perwerdeya zarokan da zehmetî kişandine. Mamosteyên ku mafê teqawidîyê girtine ji bo wergirtina vî mafî demekê mecbûr mane ku li benda biryardayina sazîyan bimînin. Piranîya beşdaran anîye ziman ku wan di vê pêvajoyê da ji xizmên xwe alîkarî dîtine. Yek ji beşdaran bi gotina xwe îfade kiriye ku digel ku mafê wî yê teqawidbûnê hebûye jî wî wekî bertek ev maf bi kar neanîye û biryar daye ku li benda vegera zanîngehê bimîne. 8 ji beşdaran di karekî daîmî û pêbawer da naxebitin. Yên ku dixebitin di sazîyên xwe da bi piranî rewşa wan demkî ye. 4 ji vanan di dema hevdîtinan da di karek da nedixebi-

tîn. Lê divê bê vegotin ku ev ji hejmara wan kesan e ku dixwazin bixebitin lê karekî nabînin. Herwiha 6 ji beşdaran mafê teqawidîyê qezenc kirine û ji van mafan sûd werdigirin. Ji bilî vê hin mamosteyan îfade kirine ku wan li derveyê welat ji bo xebatê kar dîtine lê ji ber qedexeya derketina derve nekarîbûne herin.

Piranîya akademîsyenan ji temînata aborî mehrûm hatine hiştin ku ev ji bo hilberîna akademîk hêmaneke bingehîn e, beşdarên ku teqawid bûne jî ji ber qedexeyên pêvjoya îxracê motîvasyona xwe hunda kirine. Herçendî ku beşdaran berê xwe dane karên wekî bazirganî, sazîyên taybet yên perwerdehîyê, sazîyên civaka sivîl, wergêrî jî piranîya van karan demkî û bê temînata sixorteyê bûne.

Beşdarê 11. ku bi curbecur dersxane û dibistanên taybet ra ji bo xebitînê hevdîtin çêkirine, serborîyên xwe wiha neqil kirin:

***"Min serî li çend dibistan û dersxaneyan da. Tu deng ji wan derneket. Gotin em ê li te bigerin lê tu kes li min venegerîya. Ez ji bo hevdîtineke bi detay çûm dibistanekê. Wan jî ji min ra got; "eger hûn mamosteyek bûna me yê bi we ra hesabê 5 û 10'an bikira û bazarî bikira lê em dikarin çi qasî pêşnîyaz bikin ji bo mamosteyek di qidema we da? Min jî ji wan ra got ku; qey karîyera me ya akademîk bûye bela li serê me? Û hevdîtin wisa qedîya.***

Di mijara miaşan da hemî beşdaran îfade kir ku ew bi dezavantajên îxracbûnê ra rû bi rû mane.

Wekî mînak beşdarê 1. Wiha got:

***"...wekî mînak cihê ku ez lê dixebitîm ji bo karên ku min ji bo wan dikir heqdestek gelekî kêm didan min û eger ku ji derve da yekî bigirtana wê malîyeta wan karan ji bo wan gelekî zêdetir bûna û di vê maneyê da keda min hate mêtin."***

Beşdarê 20. jî di heqê pirsgirêkên ku di lêgerîna kar da jîyaye û dezavantajên heqdestan da wiha got:

*"Di dawîyê da hûn hatin îxrackirin lê dema ku hun diçin ji bo xebatê serî li dibistanekê didin hûn naxwazin bibêjin ez hatime îxrackirin. Dema ku hûn dibêjin hinekî dikevin dudilîyê. Hûn ji wir vediqetin, ji we ra dibêjin temam em ê li we vegerin lê li we venagerin. Li cihê ku hûn lê dixebitin jî we mihtacê xwe dibinin, sîxorteya we ranazînin. Dema ku tu li wê derê dixebitî ew ji xwendekarên xwe ra dibêjin ku me ji zanîngehê ji bo we mamoste anîye lê dema ku dor tê ser heqdestê, qet li wê nanihêrin. Bi heqdesteke pir pir hindik we didin xebitandin û we bi rastî jî pir zêde didin xebitandin."*

Herwiha beşdarê 18. di heqê xebatê da hîsên xwe wiha rave kir:

*"Demeke dirêj ez li karekî negerîyam lewre xanîyê me hebû ereba me hebû û hinek jî perê me hebû. Lê demek şûn da min ji xwe ra got ku êdî divê li xwe werim û dest bavêjim tiştekî. Dema ku tu di malê da dimînî bêtir xerab dibe. Yek jî rûtîneke ku tu hînbûyî heye, her şeveq radibî û dest bi mesaîya xwe dikî. Paşê ez jî ketim lêgerînekê û min ji xwe dipirsî ku ez dikarim çi bikim. Min serî li dibistanan da. Di destpêkê da ji min ra digotin, erê tabî. Digotin hûn ê ji bo me bibin qezenceke mezin filan û bêvan. Lê dûre qet li min venedigerîyan. Carina qidema mirov ya di akademyayê da û tabî temen dibe ku bibe dezavantaj. Eger tu xort bî tu dikarî dest bavêjî her karî, eger ez jî xort bûma min ê dest biavêtana her karî. Lê di encamê da tu hatiyî temenekî û nasnaveke we heye. Kesên ku hûn nas dikin hene. Derdora we heye. Wisa tu nikarî xwe bavêjî her karî. Yek jî em ji karê bazirganîyê fêm nakin. Me her tim di ser bankayan da karên xwe çareser kirine û tu têkilîya me bi pere ra çênebûye. Em nizanin."*

Beşdarê 14. ku ji bo xebatê serî li gelek sazîyan daye û ji ber rewşa îxracbûnê nehatiye girtin, serborîyek xwe ya serlêdana kar ya sazîyeke navnetewî ya têkildarî penaberan kar dike, bi rengekî îronîk wiha neqil kir:

***"...ez di wê fikrê da bûm ku di karekî stabîl da bixebitim û sazîyek hebû ku bi penaberan ra dixebitî. Wan ji min pirsî ku gelo ez dixwazim bi wan ra bixebitim. Min jî got belê ez dikarim bixebitim. Pêdivîya wan bi yekî/a wekî min hebû. Min serî lê da, milaqat in, hevdîtin in, heqdest e û ewraqan filan min li hev civandin û paşê ji min ra gotin nabe. Ji cihekî, ji jor da talîmat hatiye. Paşê min serî li sazîyek dî da ku bi penaberan ra dixebitîn. Wan jî ji bo milaqatê bang li min kir. Ez ecibandim jî. Tam min amadekarîyên xwe dikir ku ez ê herim, li min gerîyan gotin dixwazî neyê. Lê ez di rê da bûm, çûbûm êdî. Min ji wan pirs kir ku çima dibêjin neyê. Kesê rêveber ji min ra got em nikarin te bigirin. "Na" min got ji wan ra. Hûn dikarin min bigirin. Ji alîyê teknîk va tu pirsgirêk tune ye. Ev ne xizmeta fermî ye, min got. Hûn sazîyeke civaka sivîl in, min got. Wan bersiveke wiha da min: "Em ji çewisandina dewletê ditirsin." Min jî ji wan ra got ku; 'ji xwe hûn bi wan kesan ra xeabtê dikin ku bi dewleta xwe ra pirsgirêkên wan hene, hûn hebûna xwe li ser vê yekê ava dikin'. Ev yek ji bo min pir absurd bû."***

Herçendî ku ji alîyê aborî va piranîya beşdaran li gorî dema ku li ser karê xwe bûn rewşa wan xerab bûbe jî, ji bilî wextên ku hê nûh hatibûn îxrackirin, piranîya akademîsyenan bi ser xwe va hatine û qet nebe ji alîyê pêdivîyên bingehîn va debara xwe dikarin bikin. Li kêleka piştgirîyên dost û derdora nêz û bi alîkarîya sendîkayê ku Eğitim Sen dide wan, ji bilî du beşdarên ku ne ji sendîkayê ne, rê lê vekirîye ku beşdar di asta herî mînîmûm da be jî debara xwe bikin. Hin ji beşdaran bi taybetî gilî û gazincên xwe ji bêeleqetîya sazîyên polîtîk yên kurdan kirin.

Wekî encam dikare bê gotin ku avanîya kevneşopî ya têkilîyên xizmantîya li bajarên kurdan rê lê vekiriye ku beşdar ji alîyê aborî va li ser pîya bimînin. Lê dîsa jî beşek ji beşdaran îfade kirine ku ew ji bo ku karibin li ser pîyan bimîni li gorî berê mecbûr in pir zêdetir bixebitin.

## 9-3. Bandorên Akademîk

Alîyê herî balkêş yê ku di xebata me da derkete meydanê ev bû ku bandorên akademîk yên îxracan di asteke gelekî bilind da bû. Bandora neyênî ya îxracan li ser zanîngehên Tirkîyê bi eşkerayî tê zanîn lê ku em bibêjin di vê mijarê da derba mezin li zanîngehên herêmê ketiye dê ev ne tesbîteke xelet be. Piranîya akademîsyenên îxracbûyî ku me bi wan ra hevdîtin kirin, bi derveyê welat ra têkilîyên wan hebûne û hin ji vanan perwerdeya xwe li derve temam kirine, hejmara weşanên wan û atifên ku li wan hatine kirin gelek zêde ne û dîsa hin ji vanan ji vî alîyî va mamosteyên herî baş yên zanîngehên xwe ne û piranîya wan zimanekî bîyanî bi rihetî diaxivin.

Bi taybetî zanîngehên ku li herêmê nû hatine avakirin ji bo wan akademîsyenên ku ciwan in, doktoraya xwe li derve kirine û xwe pêş xistine bûbûn navenda eleqeyê. Bi taybetî yên ku bi armanca perwerdeyê ji herêmê veqetîyabûn û dixwestin vegerin, dihatin van zanîngehan. Îxracên ku pêkhatin ne tenê vê eleqeya li van zanîngehan kuşt lê herwiha van sazîyên ku divîyabû bibûna navendên fikir û ramanên azad, divîya fikir û ramanan pêş bixistana, xiste yek formê û kir ku ev qad di destê deslhilatdarîya sîyasî da bibe qada kontrol û endoktrînasyonê. Ji xwe zanîngehên herêmê ji alî hejmara kadroyan va biçûk bûn û di ser da jî îxrackirina van 78 akademîsyenên îmzeavêj bandoreke zêdetir li ser wan çêkir.

Ev paşketina zanîngehên herêmê, di raporên URAP'ê da (University Ranking Bey Academic Performence) ku Zanîngeha Teknîkê ya Rojhilata Navîn li gorî krîterên weşanên zanistî yên zanîngehan her sal amade dike, bi rengekî aşkera tê dîtin. Li gorî vê raporê Zanîgeha Dicleyê ku di salên 2016-2017'an da di rêza 28'an da bûye di salên 2019-2020'an da rêza wê daketiye 35'an. Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê ji rêza 33'yan daketiye rêza 37'an.[6] Di gel ku di vê rêzkirinê da, atifên akademîsyenên îxracbûyî hê jî li pûanên van zanîngehan tên zêdekirin jî, rewş bi vî rengî ye. Ev jî tê wê maneyê ku akademîsyenên îxracbûyî bi tevahî dev ji hilberandina akademîk berdane. Bêguman ev paşketin ne tenê encama îxrackirina akademîsyenên îmzeavêj e lê encama hemî îxrackirinên

6 *http://tr.urapcenter.org/2019/ Dîroka Têkilîyê (20.03.2020)*

bi BDH'yan e. Lê dîsa jî divê em dupat bikin ku hin ji akademîsyenên îxracbûyî di zanîngehên xwe da ji wan akademîsyenan bûn ku herî zêde li weşanên wan atif dihatin kirin.

Xaleke dî ya ku ji alîyê bandorên akademîk va giring ev e ku akademîsyenên ku îxrac nebûne jî ji vê pêvajoyê bi giranî tesîrdar bûne. Lewre beşdarê ku îxrac nebûye anî ziman ku, ji ber bandora tirs û şikandina motîvasyonê ya di vê pêvajoyê da, hilberîna akademîk hema bêje qedîya. Di qadên zanistên civakî da jî astengkirina xebatên di hin mijaran da, bandorê li ser akademîsyenên vê qadê kiriye. Mijara bandora îxracan li ser akademîsyenên ku hîn jî dixebitin, mijareke dî ye ku divê li serê vekolîn bê kirin.

Beşdarê 1. dûrketina xwe ya ji akademîyê wiha îfade kir:

***"Dema ku ez îxrac bûm ez hê nûh bûbûm doçent û xwendekarên min yên Lîsansa Bilind hebûn. Min tezên wan qedandibûn lê me ew neweşandibûn. Wekî mînak min hîç nekarîbû li wanan binihêrim. Xwendekarên min jî li min digerin û dipirsin; 'mamoste win hê jî li xwe nehatine?' Lê min nekarîbû tu tiştekî bikira. Bi tenê min li teza xwendekarek doktorayê nihêrî ew jî ji mecbûrî; xwendekar her tim li min digerîya û rica dikir. Berîya îxracê ez yekî/a pir hilberîner bûm."***

Beşdarê 2. nêrînên xwe yên di heqê akademeyaya Tirkîyê da wiha anî ziman:

***"Dema ku akademî tê gotin tişta tê bîra min ev e; wayê 'reîs' rûniştiye û serokê SBP'ê (Sazîya Bilind a Perwedekarîyê-YÖK) Yekta Saraç li pêş wî çakêtê xwe girtiye û wisa sekinîye. Rewşa akademyaya Tirkîyê ev e. Akademî bûye cihê qezenckirina pereyan û torpîlê, ne tu tiştekî din e."***

Beşdarê 4. jî dîsa anî ziman ku naveroka akademîyê hatiye valakirin û wiha berdewam kir:

***"Fikirên min yên di heqê akademîyê da guherîn. Di vê pêvajoyê da em lê bûn şahid ku akademî ji naveroka xwe tê valakirin, dûrxistin, herçendî ev berê jî wisa bû lê di vê pêvajoyê da zêdetir pêkhat. Berê me gotaran dinivîsî, me komxebatan bi rê va dibir lê piştî ku ez îxrac bûm êdî qet ji min nayê, ez ketim mecrayên dî."***

Beşdarê 6. di heqê hejmara mamosteyan da axivî û paşketina akademîk ya zanîngeha xwe wiha îfade kir:

***"Ji bo beşekî baş divê hûn herî kêm 50 dersan pêşkêşî xwendekaran bikin. Eger ku tu dersên bijarte jî lê zêde bikî ev hejmar derdikeve 70'yî. Ji bo ev qasî dersan herî kêm pêdivî bi 20-25 mamosteyan heye. Me di beşa xwe da vê bi 9 mamosteyan dikir. Piştî îxracan xwendekarên ku li dû me man bi 3 mamosteyan an jî bi mamosteyên ku ji beşên dî yên bêeleqe dihatin mezûn bûn. Ji bilî vê beşa lîsansa bilind piştî me hew xwendekar girtin. Û ev hemî ne tenê di beşa me da wiha bû. Di gelekî beşên dî da jî ev tişt qewimîn. Piştî ev hemî qewimînan tişta ku li dû ma ev bû; asta zanîngehên me zêdetir daket û bi tevahî herêmî man."***

Ji bilî vê di heqê hilberandina xwe da vanan lê zêde kir:

"Ji xwe ji min ra wext namîne ku ez xwendinên di qada xwe da bikim û nîqaşên aktuel bişopînim. Tevlêbûna torên navnetewî, şopandina pêşketinên di branşa xwe da bi tevahî diqede. Ji xwe tu nikarî ders bidî, bi tenê dimîne ku tu vekolînê bikî û binivîsî. Demekê min ji bo ku pere qezenc bikim vê yekê kir. Ji SCS'yan (Sazîyên Civaka Sivîl) ra min çend tişt nivîsîn ku nêzî formata akademîk bûn. Tişta akademîk ku min kir bi tenê ev bû."

# 10

*Encam*

Akademîsyenên zîrek ku îmze avêtine metna “Ji Bo Aşitîyê Îmze”, bi gelek binpêkirinên mafî ra rû bi rû mane û van binpêkirinan di jîyana wan da ji alîyê derûnî, aborî, civakî û akademîk va bandorên neyênî çêkirine. Hate çavdêrîkirin ku akademîsyenên li bajarên kurdan, çewisandinên ku li ser wan hatine kirin wekî qadeke berxwedanê dîtine û digel binpêkirinên mafî jî haya wan ji mîsyona wan ya akademîsyenîya gerdûnî hebûye û bi vê hişmendîyê berdewamî li jîyana xwe kirine.

Wan bi berxwedêrî û biryardarîya xwe nîşan daye ku ew di mijarên maf, edalet, maf-bingehî, mirovîbûn û wijdanîbûn, rûmeta mirovî, mafên mirovî, azadî û bi taybetî jî di azadîya vegotinê da rûsipîtîya welat temsîl dikin. Herçendî jîyana li erdnîgarîya kurdan zehmet be jî piştgirîyên ku biçûk bin jî hatine kirin moral û motîvasyona akademîsyenan bilind kiriye û bi vê yekê wan nîşan daye ku nasnameya akademîsyenîyê pêdivî bi girêdayîna li nirxên gerdûnî tîne û herwiha hilberandina zanistî ji alîyê azadîya akademîk va gelekî bi qîmet e.

Wekî ku di îstatîstîkên têkildar da jî xuya ye; daketina performansa zanîngehan ya piştî îxracan vê yekê nîşan dide ku hilberandina zanistî bi fikira azad pêkan e. Ji vî alîyî va tesbîta bingehîn ku bi vê vekolînê me bi dest xistiye ev e; her ku azadîya akademîk û azadîya vegotinê pêş bikeve hilberînertî jî pêş dikeve. Bi vê yekê va girêdayî, hemî akademîsyenên ku îmze avêtine metna Ji Bo Aşitîyê Îmzeyek, hay ji vê yekê hene ku wan di heman demê da ji bo mafên mirovan, maf, edalet, azadî û pêşketina zanistê jî gavekî ber bi pêş va avêtîye. Binpêkirinên mafî û tangasîyên ku akademîsyenan jîyaye rê lê vekiriye ku ew bi berxwedêrîyeke bihêztir mane li van têgehan bar bikin.

# 11

## *Pêvek*

## Pêvek 1 Pirsên Vekolînê
## Forma Hevdîtinê Ya Xebata Sehayê
## Ya Projeya Akademîya Aborî Û Civakê
## Tecrubeya Bajarên Kurdan Ya Akademîsyenên Ji Bo Aşitîyê

Ev forma hevdîtinê di çarçoveya Projeya Akademîya Aborî û Civakê ya Komeleya Jîyana Nû da, bi wê armancê hatiye amadekirin ku binpêkirinên mafî û zehmetîyên jîyanê yên akademîsyenên ku îmze avêtine danezana aşitîyê û bi BHD'yan ji karên xwe hatine avêtin tesbît bike. Di çarçoveya projeyê da, wê di heqê pêvajoya îxrackirinê û qewimînên piştî îxracan da û ji bo tesbîtkirina binpêkirinên mafî yên van akademîsyenên ku li Amedê û bajarên kurdan dijîn, raporek bê amadekirin û weşandin.

| Dîroka Hevdîtinê | ............/ ............/2021 |
|---|---|
| Jimareya Hevdîtinê | BAK-21/............ |

## GÖRÜŞME SORULARI
### *KİŞİSEL BİLGİLER*

| Sn | Pirs | | Bersiv/Nirxandin |
|---|---|---|---|
| 1.1. | Yaş | Zayend | |
| 1.2. | Rewşa medenî | | |
| 1.3. | Hejmara Zarokan | | |
| 1.4. | Pozîsyona kademîk-nasnav | | |
| 1.5. | Hûn ji kîjan zanîngehê hatin îxrackirin? | | |
| 1.6. | BHD (KHK) ya ku hûn pê ji kar hatine avêtin? | | |

| | | |
|---|---|---|
| 1.7. | Dozên we yên ku dewam dikin hene? | |
| 1.8. | Gelo ji ber sedemek din doz an jî lêpirsîn di heqê we da hate vekirin? | |
| 1.9. | Gelo di mijara heqê bicihbûn û rewşa meskenê da binpêkirinên mafî li ser wê çêbûn? | |
| 1.10. | Gelo di nava endamên malbatê da ji bilî we kesên ku îxrac bûne hene? | |
| 1.11. | Gelo qedexeya we ya derketina derveyî welat heye? | |
| 1.12. | Gelo xanîyê ku hûn tê da dijîn aydê we ye yan we kirê kiriye? | |

## PÊVAJOYA ÎMZEYÊ

| SN | Pirs | Bersiv/Nirxandin |
|---|---|---|
| 2.1. | Metna îmzeyê çawa gihîşte ber destê we? | |

| | | |
|---|---|---|
| **2.2.** | **Dema ku we danezanê xwend we çawa biryar da ku hûn îmze biavêjinê?** | |
| **2.3.** | **Sedema bingehîn ku we teşwîk-sewk kir ku hûn îmze biavêjin?** | |
| **2.4.** | **Gelo hûn difikirin ku bandora nasnameya we (kurd/tirk) li ser îmzeavêtina we çêbûye?** | |
| **2.5.** | **Gelo hûn difikirin ku di navbera nasnameya we û helwesta we ya sîyasî da têkilîyek heye?** | |
| **2.6.** | **Hûn derbarê bandora vê rewşê ya di nava tevahîya îmzeavêjan da çi difikirin?** | |
| **2.7.** | **Fikra we ya bingehîn ya di heqê metna îmzeyê da çi ye?** | |

| | | |
|---|---|---|
| **2.8.** | **Gelo îro bûna we yê dîsa îmze biavêtana heman metnê?** | |
| **2.9.** | **Gelo jîyîna we ya li herêma şer, bandore li ser îmzeavêtina we çêkiriye?** | |
| **2.10.** | **Dema we îmze avêt hûn bi endamên malabata xwe ra an jî dostên xwe ra şêwirîn?** | |
| **2.11.** | **Heger hûn şêwirîbin helwestên çawa nîşan dan?** | |
| **2.12.** | **Bi ya we tu bandoreke erênî an jî neyênî ya metna "Em ê Nebin Hevparê Vî Sûcî" li ser atmosfera aşitîyê ya li Tirkîyê çêbûye?** | |
| **2.13.** | **Piştî daxuyanîya desthilatdarîyê we çi hîs kir?** | |
| **2.14.** | **Qet hîsa tirs an jî gumanê bi we ra çêbû?** | |

| | | |
|---|---|---|
| 2.15. | Kîjan mafên we ji dest we hatin girtin? | |

## PÊVAJOYA ÎXRACÊ Û BANDORÊN DERÛNÎ

| SN | Pirs | Bersiv/Nirxandin |
|---|---|---|
| 3.1. | Dema ku we bihîst hûn îxrac bûne we çi helwest nîşan da? | |
| 3.2. | Endamên malbatê îxracbûna we çawa pêşwazîkirin? | |
| 3.3. | Piştî îxracê têkilîyên we yên bi hevalên we û malbata we ra çawa guherîn? | |
| 3.4. | Tu pirsgirêkek we bi hevjînê/a we ra çêbû? (ji bo yên zewicandî) | |
| 3.5. | Piştî îxracê we tu alîkarîyeke derûnî wergirt? | |
| 3.6. | Hûn tu tedawîyeke dermanî digirin? | |

| | | |
|---|---|---|
| **3.7.** | **Tu problemeke we ya tendurustî ku li gorî we bi îxraca we ra têkildar e çêbûye?** | |
| **3.8.** | **Piştî ku we karê xwe hunda kir qet hîsên mina bêqîmetbûn û hatina dûrxistinê bi we ra çêbûn?** | |
| **3.9.** | **Li gorî we, ji alîyê derûnî va, mayina we ya li bajarên kurdan avantaj an jî dezavantajek ji we ra çêkiriye?** | |
| **3.10.** | **Piştî biryara Dadgeha Destûra Bingehîn hêvîyên we guherîn?** | |
| **3.11.** | **Gelo ji bo vegera 'Akademîyê' hûn xwe bêtir bi hêvî hîs dikin?** | |
| **3.12.** | **Hûn çawa dikarin hîsa xwe ya herî berbiçav ya ku hûnê di vegera akademîyê da bijîn tarif bikin?** | |

| | | |
|---|---|---|
| 3.13. | Gelo hûn qet hatin tehdîdkirin an jî hûn qet hedef hatin nîşandan? | |
| 3.14. | Gelo di vê pêvajoyê da we kîjan hîsê zêdetir jîya? | |
| 3.15. | Bi ya we ji alîyê bandorên ku vê serdemê li we kirine, kîjan alîyên we bêtir bihêz bûne? | |
| 3.16. | Gelo ji ber cudabûna bajarê ku hûn lê dijîn we hîç çewisandineke zêdetir hîs kiriye? | |
| 3.17. | Gelo ji ber cudabûna nasnameya we ya etnîk we çewisandineke zêdetir hîs kiriye? | |
| 3.18. | Gelo hûn difikirin ku we di pêwendîya rolên zayendî da zêdetir binpêkirinên mafî jîyaye? | |

## BANDORÊN ABORÎ

| SN | Pirs | Bersiv/Nirxandin |
|---|---|---|
| 4.1. | Gelo kesek ku hûn mecbûr in lê binihêrin heye? | |
| 4.2. | Hevjînê/a we dixebite? (eger ku hûn zewicandî bin) | |
| 4.3. | Piştî ku hûn îxrac bûn çi qas dem hûn li kar gerîyan? | |
| 4.5. | Piştî ku hûn îxrac bûn we debara xwe bi çi awayî kir? | |
| 4.6. | Dema ku hûn li kar digerîyan hûn bi çi cure pirsgirêkan ra rû bi rû man? | |
| 4.7. | Gelo we karek bi pîşeya xwe ra hemaheng dît? | |
| 4.8. | Gelo we di mijara heqdestê da ji ber îxracbûna xwe qet dezavantajek hîs kir? | |

| | | |
|---|---|---|
| **4.9.** | **Gelo we ji sazîyên civaka sivîl qet piştgirî girt an jî hûn digirin?** | |
| **4.10.** | **Gelo we ji nasên xwe piştgirî girt?** | |
| **4.11.** | **Gelo hûn mecbûr man ku hûn bajêrê ku lê dijîn biguherînin an jî mala xwe bar bikin?** | |
| **4.12.** | **Bi ya we qedexeya li ser mafê we yê xebatê bandoreke çawa li ser jîyana we ya rojane çêkir?** | |
| **4.13.** | **Hûn di kîjan cure karan da xebitîn?** | |

## BANDORÊN AKADEMÎK

| **SN** | **Soru** | **Cevap/Değerlendirme** |
|---|---|---|
| **5.1.** | **Gelo piştî îxracan we karîbû hûn xebatên xwe yên akademîk berdewambikin?** | |

| | | |
|---|---|---|
| 5.2. | **Di navbera berîya îxracê û piştî îxracê da ji alîyê hilberandina we ya akademîk va hîç guherîn çêbû?** | |
| 5.3. | **Di akademîyên piştgirîyê da an jî li derekî din we qet dersan daye?** | |
| 5.6. | **Gelo hûn wisa hîs dikin ku we di pêvajoya îxracê û piştî îxracê da li ser fikir û ramanên xwe otosansor sepandiye?** | |
| 5.7. | **Dema ku hûn li bandora azadîya ramanê ya li ser hilberandina akademîk bi-fikirin, bi ya we bandorên çawa yên vê pêvajoya îxracan li ser akademîsyenên dî çêbûye?** | |
| 5.8. | **Li gorî we zanînge-ha ku hûn lê dixebitîn ji alîyê akademîk va piştî îxracan paş ketiye?** | |

| | | |
|---|---|---|
| **5.9.** | **Hûn helwesta camîaya akademîk ya di pêvajoya îmzeyê û îxracê da çawa dibînin?** | |
| **5.10.** | **Gelo hûn wisa difikirn ku li zanîngeha we bi qasî ku dihate xwestin piştgirî çêbûye?** | |
| **5.12.** | **Li zanîngeha we berîya îxracan û piştî îxracan ji alîyê falîyetên akademîk û dersan va hûn rû bi rûyê kîjan çewisandinan man?** | |
| **5.13.** | **Gelo hûn difikirin ku we di pêvajoya îmzeyê da di dersên xwe da otosansorê li xwe sepandiye?** | |
| **5.14.** | **Gelo tu têkilîyeke we bi sazîyeke akademîk ya derveyê welat ra heye?** | |

| | | |
|---|---|---|
| 5.15. | **Gelo van têkilîyên we ji qedexeyan bandordar bûn?** | |
| 5.16. | **Gelo hûn difikirin ku ji sazîyên akademîk yên derveyî welat têra xwe piştgirî ji bo we tê dayin?** | |

Xebata projeyê ji alîyê Programa Matrayê ya Sefaretxaneya Hollandayê va hatiye piştgirîkirin. Ji naveroka xebatê bi tevahî Komeleya Jîyana Nû berpirsîyar e û ev naverok fikir û ramanên Sefaretxaneya Hollandayê nîşan nade.

## Têbinî

# Têbinî

